Mirov bi naskirina hunerê re, xwe naskir.
Huner zanîna mirov bi pêş ve bir û mirov hestyar kir.
Ne tenê li pêşberî bûyerên siyasî her wisa li pêşberî problemên civatê û kesan jî, mirov kirin xwediye hestên nazik.
Mirovên pêşî yên negihiştine huner, dîl ê bûyerên xwezayê bûn, yanî berî ku mirov huner biafirînin di bin fermana xwezayê de mîna dîl ê xwezayê bûn. Mirovan, ew bûyerên ku di xwezayê de diqewimîn weke erdhej, şewat, lehî, nexweşiyên gştî û wekî din çarenûsa xwe didîtin.
Bi riya perwerda estetîkê, mirov di nav hemû zindiyên ku li cîhana me dijîn de bûye yê herî zana û têgihiştî. Bi rastiya hunerê hem xezînên derve û hem yên di hindur de veşartî dane xebatê û pêşketin. Ji mirovên pêşî re, zîrekî, jêhatîbûn û zanist biyanî bû. Ev tiştên ku mirov bi pêşxistin û ber bi fermandariya xwezayê ve birî huner e. Zanist, exlaq û ol ji hunerê derketin û bi riya huner pêşketin û bûne malê hevparê mirovahî ye.

Kamran Simo HELBEST ÇI YE? | Lêkolîn

Kamran Simo

HELBEST ÇI YE?

Lêkolîn

INSTITUYA KURDÎ LI STOCKHOLMÊ
1996
KURDISKA INSTITUTET